



Hespê Felekê

Dîroka nêzîk, daye îspatkirin ku milletê kurd di warê têkoşîna netewî de xwedî tecrube, trajedî û pratîkek dewlemend e! Ev dîrok bi berxwedan, Serhildan, têkçûn, xapandin, bêtifaqî, dijberî, şerê navxwoyî û bi şêweyên îdeolojîk hatiye neqîşandin.

Dom»R:8



Pêşwa'yê Kurdan her-tim remz e û rêber

Li sêdaredayîna Pêşwa Qazî Mihemed di 10'ê Xakelêwe ya 1326'an a Rojî de, di dîroka tekoşîna rizgarîxwaziya gelê Kurd de destpêkeke din bû û bandoreke mezin li ser civaka Kurd a Rojhilatê Kurdistanê û tevahiya tevgera Kurdan danî. Ev bûyer ne tenê weke dawîya Komara Kurdistanê nehat dîtin, belku bû sedema ji nû ve jiyan û xurtkirina têkoşîna rizgarîxwaziya Kurdan di aliyên cuda de.

Dom» R:6

Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duhestînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (491)06-05-2025 Buha (1000) Tûmen



Banga Ocelan manadar e

Ji şîdet û şerê ku zerarê dide gelê me re 'na', ji mafên kollektîf yên neteweyî, demokratîk û kulturî yên milletê Kurd re 'erê'! Rojhilata Navîn di pêvajoyeke gelekî metirsîdar û hestîyar de derbas dibe. Di vê pêvajoya ne stabîl de, Kurdistan weke welat û kurd jî weke millet cihekî gelekî girîng digrin. Ev guherîn û bûyerên ku rû didin, dewletên dagirker yên Kurdistanê xistine nav tirs, tatolek û xofeke mezin û ji bo statukoya heye neyê guherandin çî ji destên wan tê tewsîr nakin.

Dom» R:9

Peyama rêzdar Mistefa Hicrî bi hilkefta birêveçona bi şan ya Newroza Xakîpoşan



Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta birêveçon a bi şan ya Newroza Xakîpoşan peyamek belav kir.

têgihîştina xwe ya siyasî û hişariya netewiya xwe, da selimandin û careke din jî da nîşandan ku pêdagirîkirin û îradeya yekgirtîya netewiya Kurd li pêxema nasname û mafên netewiye xwe, sermayekî mezin û hêzeke qahîm li hember desthilata xwesepên e.

Em bi çavê rêzê ve mêzeyî xweragirî û hevxeberîya we dikin, jiyana we teji xweşî û şadî be û yêkrêziya we her berdewam be.

Deqa peyamê wiha ye!

Kurdistaniyên hêja!

Keç û kurên xwedî seh û civaka xebatkar a Kurdistanê!

We azadîxwazan, ji Mako yê heta deverên başûrê Zagrosê, bi piştevanîkirin li banghêjiya rêxiravên medenî yên Rojhilatê Kurduistanê li derheq Newroza Xakîpoşan bi lidarxistina çalakane û berfireh a rêûresmên cêşna sersalê û Newroza Kurdewarî, hevxeberîyek bêmînak ji xwe nîşan da.

Tevî rewşa tepeserî û astengiyên rêjîma komara îslamî, bi wan xebatên giştî, we

Mistefa Hicrî

Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê

26 ê Adara 2025 a Zayîni



Kurd û bilindragirtina yad û navê şehîdên Kurdistanê

Dom » R:4



Girîngiya simbolên neteweyî di serdema torên civakî de

Dom » R:5

Peyama Hizba Dêmkokrat li derheq tevdaniy a panturkizm û handana navendên rêjîmê bi dijî xelkê Kurd li Urmîyê

Piştî birêveçona rêûresma bi şan a Newrozê li roja Sêşemî 28ê Reşemê li bajarê Urmîyê ku bi beşdariya zêdetir ji 100 hezar kes ji xelkê Kurd li bajarê Urmîyê û herwisa hejmarek berçav ji Tirkên bi rê ve çu, kêmnîya panturkîst bi dijayetîkirin û hevkarîya navendên ewlehî ên komara îslamî, li roja Dûşemî 2ê Xakelêweyê de bo nîşandana nerizayeti li hember rêûresma Newrziya Kurdan, xwenîşandaneke goseîlkbidest û tund bi dirûşmên netifaqiyê û bi dijî seha jiyana aşitîxwazane, bi rê ve birin.

Wan heta bi armanca bikaranîna seha olî ya xelkê û belavkirina kîn û dujmîniya zêdetir bi dijî xelkê Kurd, li banghêjiya çend rojan berî niha taybetî 21ê Remezanê hilbijartibûn ku hevdem digel salvegera şehîdbûna "Îmam Elî" bû.

Bi vê armancê, heta ji bajarên din jî bi otobûsan, xelkê anîbûne bo bajarê Urmîyê.

Bê guman, ew cure reftarên dûr ji şaristaniyane a panturkîzmê, pîlaneke rêkxistinî ye û bilî, fitneçêkirina li navbera welatîyên Kurd û Tirk ên vê parêzgehê, ku pêştir jî ceribandineke tal li wî warî de hebûye, ti qazancek nîne û zirarkerê bingehîn bi tenê, gelên Kurd û Tirk ên vê parêzgehê ne.

Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê tevî şermezarkirin a vê reftara hevpar a panturkîzm û navendên ewlehî yê komara îslamî, daxwazê ji rewşenbîr, kesayetî û civaka medenî a Tirk dike ku helwîsta pevrejîyan û şaristaniyetê hebin û rê nedin ku ew cure kiryarane, pirsgirêk û dijayetiye bêxine nav her du gelên Tirk û Kurd.

Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê li ser vê bawerê ye, li vê serdemê de civaka



Kurd û Tirk, zêdetir ji hemû caran, hewcehî bi pevrejîyana aşitîxwazane heye, ew du gel ku sedan sale bi hev re li vê niştîmanê de dijîn û heta pêwendiyên gelek zêde yê ciwakî û xizmatî jî li navbera wan de hene, mafên wan e û hewceye jî ku zêdetir geşê bi birati û pevrejîyana aşitîxwazaneyê xwe bidin.

Em daxwazê ji civaka medenîya hişar a her du gelên Kurd û Tirk û kesayetîyan, rewşenbîran û mamostayên Olî yê vê parêzgehê dîkin ku rêgiriyê ji her cure hewlek regezperestaneyê bi vê şewazê bigrin û pêka şiyana xwe hewla zelalkirin û berçavroniyê bo xelkê xwe û eşkerekirina destê nehezan, bidin.

Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê
Desteya Kargêrî
3ê Xakelêweya 1404 a Rojî

Peyama pîrozbayî ya rêzdar Mistefa Hicrî bi hilkefta cêşna Remezanê



Cêşna Remezanê, hilkefta pîroz a Misilmanan, li hemû misilmanên cîhanê bi taybet welatîyên Misilman li Kurdistanê pîroz be.

Em li halekê de vê bonaya olî pîroz dîkin ku civaka Kurdistanê, bi hemû bîr û bawerên cuda ve, sala nû û cêşna Newrozê bi bilind ragirt.

Em Hivî dîkin ku cêşna Remezanê jî, bibe hêvinê lêbihorîn, vekheviya niştîmanî û qahîmbûna tebayî ya xelkê Kurdistanê bi dijî zordarî û her cure sitemekê.

Hemû rojên we cêşin bin, bi hêviya rizgarî û paşerojek azad

Kak Mistefa Hicrî Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê bi hilkevta 10ê Xakelêwê roja Şehîdên Kurdistanê peyamek belav kir


Kak Mistefa Hicrî: Şehîdên me remza gernasî û zindîragirtina xebat û berxwedana nîfşa piştî xwe ne Deqa peyamê wihaye:

10ê Xakelêwa 1326 a rojî, Pêşewa Qazî Mihemed, Serkomarê Kurdistanê, tevî Ebulqasimê Sedrê Qazî û MihemedHusên xanê Seyfê Qazî, ji aliyê deshilata paşayetiya Îranê ve hatne sêdaredanê.

Bidarvekirina rêberê Hizba Dêmkokrat a Kurdistanê û hevrêyên wî, li dîroka xebata netewiya Kurdistanê de bûye hêmaya xweragirî û remza man û berdewamiya rêbaza teji serwerî ya Şehîdên Kurdistanê.

Li vê rojê de xelkê Kurdistanê serdana gora şehîdan û malbatên wan ên serbilind dîkin û peymanî emegnasî digel armancên wan nû dîkin. Bêguman li tevgera netewî û rizgarîxwaziya Kurdistanê de, şehîd remza cangorîkirin û zindîragirtina xebat û tekoşîna nivêşîn piştî xwe ne.

Li vê hilkeftê de silavan bo canê paqijê hemû şehîdên Kurdistanê dişînin û sozê dedin ku heta gihîştin bi armancên wan, domderê rêbaza wan bin.



Mistefa Hicrî

Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê

29ê Adara 2025 a Zayînî

9ê Xakelêwa 1404 a Rojî

Rêzdar Mistefa Hicrî, digel malbatên şehîdan civiya



Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 10ê Xakelêwe, roja Şehîdên Kurdistanê kombûnek digel malbatên şehîdan lidar xist.

Roja Înê 15ê Xakelêweya 1404 a Rojî ji aliyê beşa Şehîdan a Navenda Komelatî ya Hizbê ve bi beşdariya hejamrek ji endamên rêberî û herwisa malbatên serbilind ên şehîdan, kombûnek hate lidarxistin û ew kombûn bi sirûda netewî a "Ey Reqîb" û ragirtina bîstek bêdengî bo rêzgirtin ji canê paqijê Şehîdan dest pêkir, piştê ji aliyê rêzdar "Mehbûbe Ibtikar" a pêşkêşkar ve, xêrhatinkirin li beşdarbûyan hate kirin.

Piştê rêzdar Mistefa Hicrî Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 10ê Xakelêwe, roja Şehîdên Kurdistanê gotarek li jêr navê "Kesayetiya Şehîd û rol û bandora malbatên serbilind ên şehîdan li tevgera Kurd bi giştî û Hizbê bi taybetî", pêşkîş kir.

Rêzdar "Mistefa Hicrî" li destpêka axaftinên xwe de îşare bi 10ê Xakelêweya sala 1326 kir ku Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî ji aliyê rêjîma Pehlewî ve bi nerewa bidar vekirin.

Kak Mistefa di beşek ji axaftinên xwe de got: "niha bi hêviyê ve mêzeyî paşerojê dîkin ku bi berhevdanîn digel pêştir hêviya me zêdetir e û hewce ye xelkê me li meydana bin û malbatên şehîdan jî herwiha bi berdewamî moraldar bin.

Em hivî dîkin ku li heyamek kin de xelkê Kurdistanê bi taybet malbatên şehîdan, bigihîjin xweziyên wan ku bo vê qurbanî dane û bi salan e ku êşê dikêşin û li zehmetiyan de ne û ji vê êş û talatiyan rizgar bibin.

Rêzdar "Mistefa Hicrî" li dawiya axaftinên xwe de got: "Em bi hiviye ve sala nû dest pê dîkin û xebata xwe qahîmtir bi pêşve dibin û keyfxweşin ku Hizba Dêmkokrat li nav dilê xelkê de ye û bi yekdengî, mil bi milê xelkê azadîxawz ên Îranê, xebata xwe didomînin. Em bi hêz in û bi mûşek û bombaran serî naçemînin û rêbaza şehîdan berdewam dîkin, serkevtin bo xelkê û neman bo komara îslamî ye.

Li dawiyê de beşdarbûyan serdana pêşangeha Şehîdan kirin û lewha rêzgirtin bi malbatên şehîdan hatine pêşkêşkirin.

Kurd û bilindragirtina yad û navê şehîdên Kurdistanê



N. Bêhzad Qadirî
W. Bêhzad Simko

Newroza Îsal yek ji taybetîrîn û cuda ji hemû Newrozên din ên dîroka Kurd û Kurdistanê bû. Zêdetir ji heyvekê ye ku li gund û bajarên Rojhilatê Kurdistanê de rêûresmên Newrozê bi şêwazek bi şan û Kurdane bi rê ve diçin.

Meydanên hilkerin a agirê Newrozê, bûne meydanên nasnamexwazî û şerê hêmaya Kurdistanîyan bi dijî dagîrker û dagîrkariyê. Xelk bi rengê axê, tekezî li ser vê av û axê dikin û dirûşma "em jîûna jêdestî naxwazin, em dewleta Kurdî ndixwazin", didin. Ji Îlam û Kirmaşanê ve xwedîderkevîtin ji Urmiya dilê Kurdistanê radigehînin û ji mako û Selmasê ve peyamna "Simkoyê Şikak" digihînin bi başûrtirîn xala Rojhilatê Kurdistanê.

Bervajiyê resmên salanê pêştir ku rojên dawî yê demsala Zistanê û Reşemê de agirê Newrozê dihate hilkerin, piştî şoreşa "Jîna"yê û li wan du salane de rêûresmên Newrozî, heyama heyvekê berdeyam bû û wa tê pêşbênîkirin ku li salên bê de jî her bi vê şêwazê be.

Lê li wir de nabe xaleke gelek giring ji bîra me here, ew jî kevîna 2 hilkeftên tal û nexweş in ku li dîroka gelê me de dikevin nav rêûresmên Newrozî yê Rojhilatê Kurdistanê, yek rêkevta "16ê March" ku sala 1403 a rojî de beranber bi 26ê Reşemê û sala 1404 de beranber bi 25ê Reşemê, salvegera kîmiyabarana Helebçê li Başûrê Kurdistanê ku zêdetir ji 5 hezar Kurd, ji aliyê rêjîma herifî ya Beisê ve hatine şehîdkirin; Rêkevta din 10ê Xakelêwe ye ku salvegera bidarvekirina a yekem serkomarê Kurdistanê "Pêşewa Qazî Mihemed" û hevrêyên wî ji aliyê rêjîma herifî ya Pehlewî ve ye.

Em gelê Kurd, netewek şa ne û çand û kultûra me wek sirûştta me, rengreng e. Vê yekê jî karlêkerî bi ser şêwazên



dîlanê li nav Kurdan de kiriye anku bo nîşandana xweşî û şahiya xwe, dîlanê nakin belku, dîlana taybet bi şer û taziyan jî me hene.

Dema xwe û bi dirêjahiya dîrokê, dema ku bavkalkên me li şer de dujmin dişkadin, govendk girêdan didan û dîlaneke taybet bi şer dikirin; Herwisa li dema şîn û taziyan de jî dîlaneke taybet bi xwe me hebûye ku renga niha li hinek deveran de wek resim, mabe.

Lê bi giştî, kultûra Kurdî ji çanda girî û taziya berdeyam bervajiyê kultûrên derdora me, bi dûr bûye, hekî gundên Kurdistanê wek mînak berçav bigirin, malê wa hebûye ku daweta wan hebûye lê bi sedema vê ku cîran an hevgundiyê wî tazî hebûye, bo rêzgirtin ji vê malbatê û bi hebûna exlaq û camêriya Kurdî, daweta xwe bi paş xistiye û piştî jî li ser îzna xwdiyê taziye daweta xwe lidar xistine; Lê Newroz ji wan hemû mijaran, cuda ye, Newroz cêşneke netevî, kevna û dîroka Kurd û Kurdistanê ye û hêmaya nûbûn û nasnameya me ye.

Kurd li nexweştirîn demên dîrokê, agirê Newrozê her hilkeriyê da ku bide selimandin qet serî naçemîne û heta Kurdek mabe, ne tenê Kurdistan dê her bîninê, belkû agirê Newroza Kurdewarî jî her hil bike.

Wek mînak, dema ku li 16ê Marchê de li Başûrê welatê me de yada Helebçê tê bilindragirtin, ne civan e û ne deigel exlaqê me yê Kurdîniya me li Rojhilat de bi erênê tê dîtin ku bê

pîşewazî, li Newrozê dîlanê bikin û şahiyê lidar bixin. Herwisa biryar jî nine ku taziye lidar bixin.

Em jî wek xelkê Başûrê Kurdistanê, xwdiyê şehîdên Helebçê ne lê netenê xwdiyê şehîdên Helebçê ne belku xwdiyê hemû şehîdên doza rizgariya Kurdistan li hemê beşên Kurdistanê ne, ku wa ye, an rêuresma Newrozê bi rê ve nabin an hekî me bi rêl ve bir, dîlanê nakin û bi tenê agirê Newrozê hildikin û bi cihê starên şayiyê, sirûdên niştîmanî disitrînin û bi hiljirina şemal û bilindkirina wpênayên şehîdên Helebçê, yad û navê wan bi bilind radigrin û peyama yekîti, hevhemî, û hevxiwîniya xwe xwe bigihînin xwîşk û baryên me yê li Başûrê Kurdistanê.

Eva bi xwe jî peyamek bi dagîrkeran e ku sînorên destkirdên wan, qet nikare me ji hev biqetîne.

10ê Xakelêweyê jî li Rojhilatê Kurdistanê bi roja "Şehîdên Kurdistanê" hatiye navdêrkirin, ev roja, salvegera bidarvekirin a "Pêşewa Qazî Mihemed" û hevrêyên wî (Seyf Qazî û Sedir Qazî) ji aliyê rêjîma herifî ya pehlewî ve ye.

Ti rojek li salnameya Kurdistanê de nîne ku me li vê rojê de şehîd nedabin, lê ev roja cuda ji rojên din e, vê yekê jî çendîn sedem hene; Yekem ev e ku "Pêşewa Qazî Mihemed" kesasiyetîk Hizbî an deverî nîne, belkû zêdetir her çarçoveyek hizbî, hizrî û îdeolojiyekê, kesasiyetîk niştîmanî û netewî ye, avakerê yekem Hizba modern a Kurdî û yekem Serkomarê

Kurdistanê ye û niha jî bi sedan hezar kes li ser rêbaza vî bi şêwazên cuda, çalakî û xebatê dikin.

Ya Duyê ev e ku li hemû welatên cîhanê de rojek bo kuştîyên welatê xwe diyarî kirine û li vê rojê de bi şêwazên cur bi cur yad û navê wan bilind radigrin, em jî vê rojê de yad û navê "Şehîdên Kurdistanê" bilind radigrin û soza xwe digel wan, dubare dikin.

Îsal jî tevî berdewamiya rêuresmên Newrozî, xelkê Kurdistanê li roja 10ê Xakelêweyê de ti rêuresmeke Newrozî bi rê ve nebirin.

Ev jî asta bilindî û hişariya netewî ya xelkê me dide xuya. Xelkê Kurdistanê li vê rojê de serdana gora şehîdan kirin û gullên sor ku hêmaya Şehîdên Kurdistanê ye li ser gora wan danîn. Xelkê welatparêz ên Kurdistanê, serdana malbatên serbilind ên şehîdan kirin û destîgulên emegnasî û rêzgirtinê, pêşkêşî wan kiirn û bi wan soz dan ku heta gihîştin bi armancên bilind ên netewa xwe, domderê rê û rêbaza şehîdan bin.

Herwisa têkoşeran bo bilindragirtin a yada Komara Kurdistanê, li 10an bajar û gundên Kurdistanê de alayabîroz a Kurdistanê bilind kirin.

Kurdistanîyan, ne şayî kirin û ne tazî girtin, selimandin ku çawa xwdiyê agirê Newrozê ne, bi heman şêwazê, xwdiyê Şehîdên Doza rizgariya Kurdistanê ne û bo bêrêzîkirin bi şehîdên xwe, nakevin ti daf û pîlaneke dagîrkeran.

Girîngiya simbolên neteweyî di serdema torên civakî de



N. Dr. Mecîd Heqî

Beşa 2 û Dawî

Newroz û nasnameya kurdî li gorî demê

Medyaya civakî rê da gelê Kurd ku pîrozbahiyên xwe yê Newrozê li cîhanê nîşan bidin û nasnameya xwe ya çandî li qada navneteweyî pêş bixin. Ev yek du qat girîng dibe, bi taybetî di şert û mercên ku rejîmên serdest hewl didin nasnameya kurdî bitepîşîn û ji holê rakin.

Newroz di dîrokê de bûye şahidê gelek hilketin û daketîna. Di hinek deman de ev şahî bi eşkereyî û bi heybet dihat lidarxistin û hinek jî ji ber zext û qedexeyan bi dizî û veşartî dihat lidarxistin. Lê Newroz her tim di dilê gelê Kurd de zindî bûye û nîş bi nîş bûye simbola hêvî û berxwedanê.

Rola jinê di parastin û pêşxistina simbolên netewî de

Jina Kurd di dirêjahiya dîrokê de ji bilî beşdarbûna çalak di têkoşîna rizgarîxwaziya gelê Kurdistanê de, di parastin û pêşxistina simbolên netewî de roleke girîng lîstîye. Cilên neteweyî û herêmî, stran û çîrokên kevneşopî gelek caran ji aliyê jinan ve hatine parastin û derbasî nîşên paşerojê bûne. Jinên Kurd bi destên xwe yê hunerî kincên rengîn û bedew li xwe dikin û bi dengê xwe yê germ stranên epîk û romantîk dibêjin. Bi çîrok û efsaneyên xwe dîrok û çanda gelê Kurd zindî dihêlin. Di cejna Newrozê de jinên Kurd bi lixwekirina cil û bergên kurdî û beşdarbûna di rêûresm û dîlanên kurdî de roleke berçav di parastin û pêşxistina vê cejnê de dilîzin.

Bandora koçberiyê li ser nasnameya neteweyî

Koçberiya welatên din ji bo parastin û pêşvebirina nasnameya neteweyî derfet û zehmetiyên nû afirandîye. Medyaya civakî û teknolojiyên dijîtal roleke girîng di girêdana Kurdan li seranserê cîhanê û domandina têkiliyên çandî de dilîze. Kurdên li welatên cuda bi van amûran cejna Newrozê pîroz dikin, nûçe û zanyariyên li ser Kurdistanê parve dikin û bi hev re di têkiliyê de ne.

Lêbelê, koçberî dikare bibe sedema dîrketina ji çand û kevneşopiyên neteweyî. Nîşên nû yê ku li welatên din mezin dibin, dibe ku kêmkirina ziman

û çanda kurdî nizanin. Ji ber vê yekê xebatên ji bo parastin û pêşxistina nasnameya netewî di nav Kurdên li welatên din de xwedî girîngiyeke taybet in.

Rola huner û wêjeyê di xurtkirina nasnameya netewî de

Huner û wêjeya kurdî bi kêşeyên netewî û dîrokî, di xurtkirina nasnameya netewî de roleke girîng dilîze. Fîlm, muzîk, tablo û wêjeya kurdî amûrên bi hêz in ji bo derbirina hestên neteweyî û pêşxistina çanda kurdî. Hunermend û nivîskarên kurd bi berhemên xwe rastiya jiyana gelê kurd, têkoşîna azadî û dadperweriyê û îdealên wî yê netewî radixe ber çavan. Di cejna Newrozê de huner û wêjeya kurdî bi taybetî balê dikişîne. Helbestvan û nivîskarên kurd li ser Newrozê û girîngiya wê ya ji bo gelê kurd helbest û çîrokên çêdikin. Hunermendên Kurd bi temaya Newrozê tablo û berhemên din ên hunerî diafirînin. Di vê şahiyê de muzîk û dîlanên kurdî jî cihêkî taybet digirin.

Nasnameya Neteweyî di Serdema Dijîtal de

Tevî îmkanên ku teknolojiyên dijîtal ji bo parastin û pêşvebirina nasnameya neteweyî peyda dikin, dijarî jî hene. Belavkirina dezînforsasyon, propagandayên neyînî, û hewildanên be-rewajîkirina dîrokê ji wan metirsiyan in ku di serdema dijîtal de nasnameya neteweyî tehdîd dikin. Rejîmên desthilatdar bi van amûran hewl didin dîrok û çanda Kurdan berevajî bikin û di nava gelê Kurd de parçebûnê çêbikin. Di heman demê de, dibe ku algorîtmayên medyaya civakî ji ber filterên agahdarî hin naverokên ku bi çand û nasnameya neteweyî ve girêdayî ne sînordar bikin. Ev dikare bibe sedema kêmkirina agahî û naveroka çanda kurdî.

Ji bo berevajîkirina gefên li ser nasnameya neteweyî ya di serdema dijîtal de, pêdivî ye ku hişmendiya gelemperî li ser ka teknolojiyên dijîtal çawa dixebite zêde bibe. Divê gelê Kurd bikaribe agahiyên derew û rast ji hev cuda bike û amûrên dijîtal jî bi aqil bi kar bîne.

Her wiha pêwîst e ku bi zimanê kurdî naverokeke çandî û dîrokî ya resen û bi destan bê çêkirin û weşandin. Ev dikare alîkariya şerkirina dezînforsasyon û berevajîkirina dîrokê bike.

Rola rêxistinên civaka sivil

Rêxistin û sazîyên civaka sivil dikarin di parastin û pêşxistina nasnameya netewî de roleke girîng bilîzin. Lidarxistina mîhrîcanên çandî, pêşangehên hunerî, atolyeyên perwerdehiyê, hilberandina naveroka perwerdehiya bi zimanê kurdî ji wan tedbirên ku di vî warî de têne girtin in. Divê sazîyên çand û perwerdehiyê bi teknolojiyên



dijîtal naveroka perwerdehiyê û çandî bi berfirehî bigihînin gelê Kurd. Divê bi lidarxistina qursên perwerdehiyê hîn gelê Kurd bikin ku çawa amûrên dijîtal rast bikar bînin.

Hevkariya navneteweyî bi rêxistinên çandî û perwerdehiyê yê li welatên din re dikare bibe alîkar ku nasnameya neteweyî ya kurdî were parastin û pêşvebirin. Danûstandina ezmûnan, lidarxistina bernameyên hevbeş, piştgirîkirina berhemên naverokên çandî ji warên hevkarîyê ne.

Rêxistinên navneteweyî dikarin bi pêşkêşkirina alîkariya aborî û teknîkî alîkariya sazîyên çandî û perwerdehiyê yê kurdî bikin di berhemên naveroka çandî û perwerdehiyê de. Dikarin bi lidarxistina atolyeyan hunermend û nivîskarên kurd di warê bikaranîna teknolojiyên dijîtal de perwerde bikin.

Bandora zîrekiya çêkirî li ser zimanê kurdî

Zehmetiya çêkirî hem bandorên erênî hem jî neyînî li ser zimanê kurdî dike. Ji aliyekî ve, ew dikare bi wergera makîneyê, hilberîna naveroka perwerdehiyê, û pêşkêftina amûra ziman re bibe alîkar. Ji aliyê din ve dibe ku di hin rewşan de bikaranîna zimanê kurdî kêmkirina bibe.

Mînak wergera makîneyê dikare bibe alîkar ku naveroka kurdî berfirehtir bibe. Çêkirina naveroka perwerdehiyê li ser bîngeha zîrekiya çêkirî dikare bibe alîkar ku zimanê kurdî ji nîşên nû re hîn bibe. Pêşxistina amûrên ziman ên AI-ê dikare alîkariya parastin û pêşvebirina zimanê kurdî bike.

Lê belê bikaranîna îstixbarata çêkirî dibe sedema kêmkirina bikaranîna zimanê kurdî di hin waran de. Wek mînak bikaranîna wergera makîneyê dibe sedema kêmkirina motîvasyona fêrbûna kurdî. Bikaranîna amûrên zi-

manî yê AI-ê dibe ku bibe sedema kêmbûna afirîneriya di bikaranîna zimanê kurdî de.

Ji bo parastina zimanê kurdî di serdema îstixbarata çêkirî de, pêwîst e ku daneyên zimanê kurdî bînin berhevkerin û bigihînin pêşdebîrên îstixbarata çêkirî. Her wiha pêwîst e ji bo zimanê kurdî amûrên zimanî yê AI-ê werin pêşxistin.

Divê hikûmet û sazîyên navneteweyî destekê bidin berhevkerina daneyên zimanê kurdî. Divê ew piştgirî bidin pêşxistina amûrên zimanê AI-ê yê ji bo zimanê kurdî.

Cejna Newrozê yek ji simbolên herî diyar ên yekîtiyê û îradeya gelê Kurd e, ku ji cejneke sade wêdetir, nîşana dîrok, çand û îdealên vî gelî ye. Di cîhana nûjen de, bi hatina teknolojiyên dijîtal û îstixbarata çêkirî re girîngiya van simbolan du qat zêde bûye. Torên civakî ji bo danasîna nasnameya neteweyî û çandî ya gelê Kurd, platformek pêşkêş kirine û rewşenbîriya çêkirî jî dikare di parastin û berfirehkirina vê nasnameyê de roleke erênî bilîze.

Di heman demê de dewletên dagirker bi çewisandina çandî û guhertina dîrokê hewl didin ku nasnameya kurd tune bikin. Lê belê ciwanên jêhatî û xebatkar ên Kurdistanê bi bikaranîna amûrên dijîtal û teknolojiyên nû berxwedana xwe berdewam kirin û nasnameya xwe ya netewî parastin. Cejna Newrozê îro ne tenê cejneke e, keleha parastina çand, ziman û dîroka gelê Kurd e. Rewşenbîrî û torên civakî dikarin weke alaveke nû ji bo bihêzkirin û cîhanîkirina vê nasnameya neteweyî û vekirina rê li ber azadî û serxwebûna nîşên paşerojê bînin bikaranîn.

Pêşewa'yê Kurdan hertim remz e û rêber



N. Serbest Urmiye

Li sêdaredayîna Pêşewa Qazî Mihemed di 10'ê Xakelêwe ya 1326'an a Rojî de, di dîroka tekoşîna rizgarîxwaziya gelê Kurd de destpêkeke din bû û bandoreke mezin li ser civaka Kurd a Rojhilatê Kurdistanê û tevahiya tevgera Kurdan danî.

Ev bûyer ne tenê weke dawîya Komara Kurdistanê nehat dîtîn, belku bû sedema ji nû ve jiyân û xurtkirina têkoşîna rizgarîxwaziya Kurdan di aliyên cuda de.

Bû sedem ku tevgerên siyasî, çandî, civakî û çekdarî di Rojhilatê Kurdistanê de ji nû ve werin rêkxistin û rêyeke nû di tekoşîna netewexwaziya Kurd de were vekirin.

Li jêr, em dê bandora Şehîdbûna Pêşewa Qazî Mihemed li ser civaka azadîxwaz a Rojhilatê Kurdistanê şirove bikin.

Bihêzkirina tevgera nasnamexwaziya neteweyî:

Yek ji encamên girîng ên Şehîdbûna Pêşewa'yê Kurdan, hevgirtin û bihêzkirina tevgera nasnamexwaziya neteweyî di Kurdistanê de bû.

Piştî hilweşandina Komara Kurdistanê, hikûmeta navendî ya Îranê hewil da ku vê bûyerê di hizir û bîreweriyên dîrokî yê gelê Kurd de tune bike, lê berevajî vê yekê, vê bûyerê weke sembola berxwedan û têkoşînê di hizir û hebûna Kurdan de cih girt.

Mêrxwasî û gelheziya Qazî Mihemed di wêje, mûzîk û çanda devkî û nivîskî ya Kurdistanê de ma û bû remzek ji



bo ku hevgirtina neteweyî di nava Kurdan de bihêz bike.

Pêşewa'yê mezin bû sembola berxwedanê ji bo nîfşên paşerojê yê têkoşerên Kurd û di hizir, dîrok û hebûna Kurdan de hilweşandina Komara Kurdistanê weke mînak çewsandinê û hegereke bingehîn ji bo tekoşîna rizgarîxwaziye pêl avêtin.

geşekirina hêz û rêkxistinên siyasî yê Kurd:

Piştî hilweşandina Komara Kurdistanê ji aliyê desthilata dagîrker a Pehlewî ve, piraniya çalakvanên siyasî yê Kurd gihîştin wê encamê ku bidestveanîna mafên siyasî, neteweyî û bi giştî mafê çarenivîsê hewcehî bi rêxistin û xurtkirina tevgera mafxaziye heye.

Ev yek jî bû sedem û bingehê ji bo geşekirin û berfirehbûna hêz û partiyên siyasî yê Kurd.

Bo mînak, Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê (PDKI) ku piştî nemana Komara Kurdistanê roleke girîng di berdeambûn û zindîragirtina têkoşîna Kurdan de hebû û heye.

Ji bilî vê, tevgera rizgarîxwaziya kurd li başûr û bakûrê Kurdistanê jî di bin siya bandora Komara Kurdistanê de, ji bo bidestxistina mafên xwe çala-

kiyên xwe yê siyasî û leşkerî xurtîr kirin.

Serkutkariya hikûmeta dagîrker û bertekên azadîxwazan:

Piştî darvekirina Pêşewa'yê Kurdan, hikûmeta Pehlewî siyasî yê xwe yê çewisandin û tepeser kirinê li hember Kurdan zêdetir kirin.

Siyasetên weke xurtkirina hêza leşkerî li herêma Kurdistanê û tepeser kirina tevgerên siyasî û civakî, sînoordarkirina ziman û medyaya Kurdî, girtin û sirgûnkirina çalakvanên siyasî yê Kurd.

Lêbelê siyasî û zextên han, ne tenê têkoşîna gelê Kurd ji bo maf û azadiyên xwe nefetisandin, belku bûne sedem ku komên Kurd berê xwe bidin rêyên nû yê berdeambûna têkoşînê û her wiha bûne sedema çalabûna hêza Pêşmerge û berxwedana çekdarî.

Di warên çandî û civakî de:

Ji bilî têkoşîna siyasî û leşkerî Şehîdkirina Qazî Mihemed, bandora herî berfireh li ser hişyariya siyasî û giştî ya Kurdan danî.

Bi terzekê ku zane, xwendekar û rewşenbîrên Kurdan bi terzeke berfireh dest avêtin lêkolînan li dor dîro-

ka tekoşîna rizgarîxwaziya Kurdistanê û gelê Kurd zêdetir şarezayî dîrok û nasnameya xwe bûn û ev hişyarî derbasî nîfşên piştî xwe jî kirin.

Herwiha bû sedema geşekirina tevgerên çandî û civakî li Rojhilatê Kurdistanê. Bandoreke mezin li ser helbest û wêjeya berxwedanê danî û gelek helbestvan û nivîskarên kurd li ser Komara Kurdistanê û kesayetî û mezinatiya Qazî Mihemed berhemên rengîn û balkeş afirandin.

Di rastî de bi Şehîdbûna Qazî Muhammed ne tenê têkoşîna siyasî, mafxwazî û neteweyî ya Kurdan nesekinî, belku bû sedema ji nû ve avakirin û bihêzkirina tevgera rizgarîxwaziye li Rojhilatê Kurdistanê û sembola tekoşîna rizgarîxwaziye di beşên din ên Kurdistanê parvekirî de jî. Bû sembola berxwedanê û bandora wê li ser geşekirina partiyên siyasî, xurtbûna têkoşîna çekdarî li dijî dagîrkeran û hişyariya siyasî, çandî, neteweyî û ... htd di Kurdistanê de xuya ye.

Lewma ye ku meriv dikare bibêje ku Pêşewa'yê Kurdan bi gorîkirina canê xwe, bû destpêkeke dîrokî di tekoşîna tevalî ya gelê Kurd de û di hizir û bîr û baweriya Kurd û Kurdistanîyan de hertim zindî ye û rêberiya rêya serkewtinê dike.

Nerîna



“Mîstefa Hicirî”:

“Mîstefa Hicirî” li dawîya axaftinên xwe de got: “Em bi hiviye ve sala nû dest pê dikin û xebata xwe qahîmtir bi pêşve dibin û keyfxweşin ku Hizba Dêmkokrat li nav dilê xelkê de ye û bi yekdengî, mil bi milê xelkê azadîxawz ên Îranê, xebata xwe didomînin.”



“Mesrûr Barzanî”:

„Divê Hikûmeta Îraqê tazmînatê bide Kurdên Feylî,,



“Cevdet Yilmaz”:

“Divê êdî PKK kongreya xwe li dar bixe”



“Mihemed Şiya Sûdanî” :

“Bi tevgereke aqilmendane me Îraq ji şer dûr xist

Şoreşa Jînayê û Newroz



N. Eskender Ceiferî

Cejna Newrozê ya îsal li Kurdistanê di nava rewşeke taybet a siyasî de hat pîrozkirin. Bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê şahî rastî zextên pasdarên Îranê hatin.

Di nava heyva derbasbûyî de herî kêm 74 kes li bajarên wekî Şino, Pîranşar, Ormiye, Merîwan, Sine, Kirmaşan, Serdeşt, Seqiz û Bokanê hatine girtin. Ew bi beşdarbûna di pîrozbahiyên Newroza Xakîpoşan de, handana xelkê din û kesên ji navçeyên din ji bo beşdarbûnê an jî hildana dirûşmên ji bo piştigiriya şoreşa Jin, Jiyan Azadî ya Kurdan li hemberî dagirkar û her wiha dirûşmên dijî-kolonyalîstî û dijî-faşîstî tîrên sûcdarkirin.

Li gel ku li Îranê pîrozkirina Newrozê weke cejneke netewî ya Farsan nayê qedexekirin, lê li Kurdistanê qedexetî li ser wê hene. Ji ber ku Kurd ne tenê weke destpêka biharê, di heman demê de Newrozê weke firsendek û derfetekê ji bo hildan û xuyakirina daxwazên xwe jî dibînin û bi kar tînin. Rêkarên çewisandinê yê dagirkar ji girtin û lêpîrsînan heya îşkenceya fîzîkî pêk dihat.

Lê xelkê Kurdistanê cejna xwe li dar xist. Îsal li gelek bajaran ji wan li Merîwan, Ormiye, Sine û Kirmaşanê, pîrozbahiyên gel bi betalkirina destûrê hatin qedexekirin. Lê dîsa jî, Kurdistanîyan nexwest ku bitirsin û tevî hebûna çavdêriya mezin ya hêzên ewlehiyê yê dagirkar, pîrozbahî berdewam kirin. Heya niha derbarê kesên ku hatine desteserkirin de ti agahî li ber dest nîn e.

Çalakvanên mafên mirovan ên navxwe dibêjin; Di nav girtiyan de du xwişkên bi navên Evîn Ehmedî û Sarya Ehmedî jî hene ku di roja 19'ê Adarê



de li bajarê Ormiyê hatibûn girtin. Bi taybet girtina Seyfullah Xan Garfarî yê 78 salî li bajarê Seqezê di 21'ê Adarê de cihê matmayînê ye ji ber ku dagirkar pîr û kalan jî digire. Hunermend jî bûne armanc: Muzîsyen Foad Keşawarz di 15'ê Adarê de li Seqizê piştî lîxistina stranên şoreşgerî hate girtin û hunermend Hesên Kakayî jî neçar ma ku di 13'ê Adarê de daxuyaniyeke nivîskî wajo bike û li gor wê, soz da ku beşdarî pîrozbahiyê nebe.

Çalakvan radigihînin ku dezgehên ewlekarî yê gelek bajarên Kurdistanê pêşwext bi rêya tîlêfonê yan jî bi rêya bangewaziyên fermî hişyarî dane kesatiyên naskirî ku dirûşmên rexnekirina rêjîmê hil nedin. Tevî van gefan jî di Newrozê de dirûşma “Jin, Jiyan, Azadî” ya tevgera jinên Kurd ji aliyê gelek kesan ve li Kurdistanê hate berzkirin.

Li Rojhilatê Kurdistanê gelek caran şahiyên Newrozê çend hefteyan berdewam dikin û roja sereke jî 21ê Adarê ye. Tevî zext û zordariyên zêde jî, diyar e ku gelê Kurd ne amade ye ku serî li ber qedexeyên dagirkar bitewîne. Banga azadî, wekhevî û mafên jinan li Kurdistanê zindî û bênavber dimîne.

Tevî ku pîrozbahiyên li Rojhilatê Kurdistanê di bin siya zextan de berdewam bûn, li Bakurê Kurdistanê, daxwazên siyasî yê zelal hebûn. Li bajarên wekî Amed, Colamêrg, Şemzînan û Mêrdînê gel bi girseya xwe ya mezin li dora agirê Newrozê kom bû. Di

daxuyaniyê de bal hat kişandin ser lihevkerina di navbera Kurd û Tirkan de û azadiya girtiyên siyasî, di serî de Rêberê PKK'ê Ebdulla Ocalan. Di cejna Newrozê de gelê me li wir ji dewleta Tirk xwest gavên şênber ên dêmokratîkbûnê ji aliyê dewletê ve bîr avêtin.

Li Rojavayê Kurdistanê pîrozbahî li gorî salên berîşoreşa Sûriyê, aram û azadane bû. Gel bi agirên di destên xwe de pîrozbahî li dar xist û dirûşmên dêmokrasî, azadî û wekheviyê qîriyan. Asayîşa Rêveberiya Xweser a Rojava destnîşan kir ku her tişt bi awayekî azadane bi rê ve diçe.

Newroz li başûrê Kurdistanê jî bi agirên mezin û çalakiyên girseyî ji aliyê xelkê ve hat pîrozkirin. Li bajarên weke Akrê, Hewlêr û Silêmanî jî gel bi Kurdên parçeyên din ên Kurdistanê re hevxeberiya xwe nîşan da. Ji ber sîstma fêdêral ya ku li Başûrê Kurdistanê ji sala 2003'an û vir ve heye, pîrozbahî bîyî zordestiya dewletê pêk hatin.

Newroz di 20 an 21'ê Adarê de ji aliyê gelek gelên Rojhilata Navîn ve, di nav de Efxan, Kurd, Tacîk û Farsan tê pîrozkirin.

Digel ku Newroz ji bo piraniya wan neteweyan weke sersal an destpêka biharê tê hesibandin, lê ji bo Kurdan wateyek siyasî ya taybetî heye: ew sembola berxwedanê ye û derfetek e ku daxwazên xwe yê mafê çarênivîsê, dabînkirina dadmendî û dêmokrasîyê diyar bikin.

Hespê Felekê



N. Cano Amedî

Dîroka nêzik, daye îspatkirin ku milletê kurd di warê têkoşîna netewî de xwedî tecrube, trajedî û pratîkek dewlemend e!

Ev dîrok bi berxwedan, Serhildan, têkçûn, xapandin, bêtifaqî, dijberî, şerê navxwoyî û bi şeweyên îdeolojîk hatiye neqîşandin.

Hişmendî û bertekên Kurdewarî pirî caran bi destê dagirkeran ve hatiye dorpêç kirin, bê aqûbetî û berjewedîyên kesayetî, grûbî rê li ber trauma û trajedîyan xweş kirîye.

Ji ber ku dewletên dagirker bi ruhê peymanê Sadabadê tevdigerin ev dused sal zêdetire bi gen û tevna civatê dileyizin, dîzaynê dikin û ji xwe re hevalbendan amade dikin.

Ev Operasyonên hanê bi kirasê îdeolojîk tîn meşandin.

Di demsalên têkçûn û fetisandinê de, bayê desthilatdar her tim rê li ber nêrîn û şîroveyên cûda digire û siyasetek çavsoriyê derdixe pêş.

Rexne, îtiraz, pirs û bersîv tîn qedexekirin, bîat, îttîhat li ser civatê tê ferzkirin.

Dewletên dagirker bi aqlê dewletê tevdigerin, gav davêjin, siyasetê dizaynê dikin. Berjewedîyên xwe, desthilatdarî û hebûna xwe li ser înkâr, îmha û tunebunê didomînin.



Di demên tengasîyê de jî mekanîzma dîyalogê dixin rojevê.

Çend “şekirên qulpikî” çend gotinên efsûnî, bi rêya lîrandinê pêvajoya xapandinê dimeşînin.

Ev jî hikmeta aqlê dewletê ye.

Li hemberî vê hişmendîyê, li taxên kurdî, ne aqlê dewletbûnê heye, ne jî hişmendîya netewî heye.

Aqlê kurdî, hişmendîya netewî û berjewedîyên milî di demsala zivistanê de maye.

Armançên hevbeş, stratejîk û netewî li gorî plansaziya hedefên nêzik, hedefên navîn û hedefên dûr yê stratejîk tê meşandin.

Gava tifaq û hevkarî jî li gor wê plansaziyê bê meşandin, bersîvdayîna pêvajoyên dijwar hêsantir dibe.

Lewra hêza hişmendîya netewî, sînerjîyek milî, piştgirî û enerjîyek xurt dide têkoşîna netewî.

Gava hemû beşên civatê berjewedîyên xwe di bin sîwana netewî

de bibînin, wê gavê destê dîyalogê xurtir dibe û daxwazên netewî derdikeve pêş.

Ev jî di nav civatê de bîrûbaweriyên kûr û germ geşdike.

Lê mixabin, ji ber ku qalibên îdeolojîk, hînbûnên dema şerê sar, nerîn û ezberên çargoşe, nexweşîya ego û ezîtiyê rê li ber hişmendîya netewî asê kirîye û îro jî didome.

Armançên netewî pirî caran bûye û dibe qurbana armançên kesayetî û partîzanî.

Ev siyaseta jî rê li ber berjewedî û tifaqên demkî, menfeatên rojane vedike.

Şûna hewldanên stratejîk de; hewldanên lîrandinê, xweşkirinê, çêrandinê û menfeatên şexsî/komî derdikeve pêş.

Ev jî encamên siyaseta makyavelist e!

Hişmendîya “do do bû, îro îro ye” di heman demê de dibe parêzname û fetwa hewldanên hemû xirabîyan.

Ji ber ku di warê rêxistinbûyîn û hişmendîya netewî de em ne lihevkerî û ne amade ne; fersendên çêdibin em nikarin jê sûd bigirin.

Gotinek kurdî heye: Hespê Felekê ji sedsalî carekê di ber deriyê mirov re derbas dibe, yê amade ne suwar dibin, digihîjin armançê xwe. Yê ne amade ne jî baca xwe didin.

Her derengîyek an bêtifaqîyek rêya me dirêj, barê me giran dike.

Ev nexweşîya hanê sed sal zêdetir e didome; bi aso û pêşbînîyên rojane herkes di kozika xwe de dest davêje şûr û mertalan, bi tîr û kewanan dest bi êrîşanê dikin.

Gelo milletê Kurd wê cardin li benda hêviya hatina Hespê Felekê bisekinin an jî wê rota dahatûya qedera xwe biguherînin? Bersîva vê pirsê jî di kûrahîya naveroka paradîgmaya îro rojevê tayîn dibe de veşartîye.

Banga Ocalan manadar e



N. Letif Epozdemir

Serokê PKK Abdullah Öcalan berî çend rojan bang li PKK kir û got “Xwe hilweşînin û şerê çekdarî biqedînin. Ew çonxê berê borî, dema xebata demokratîk e.” Ev bang, bangek balkêş û watedar û giring e. Dîyare ku Öcalan dixwaze rêxistina xwe piştî 45 salan bi destê xwe hilweşîne.

Di mercên îro de, xizmeta herî baş ew bu ku PKK xwe hilweşîne. Şedadî, dijarî û tundayetî ji nav civatê rabe, jîyan normalize bibe, ne çek; lê insan û fikir bipeyîvin, zemîna diyalogê peyda bibe, feraset werin guhertin, kîn û xerez û neyartî û çehvnebarî biqede, ji herdu alîyan rayedar bikaribin guhdarîya hev bikin, gotubêj bikin, bi şewazeke aştiyane rêyek peyda bikin ku Kurd jê qail bin û Turk jî belêni bikin da ku ev pirsgirek bi dadwerî were çareser kirin.

Ev banga Öcalan bi raya min wê dergeyê qonaxêke nu veke. Lewraye ku Öcalan bi vê biryarê, fedekarî û hestiyariyek giring pêk tîne. Ne hewceye ku Öcalan ji bo Kurda tiştek bixwaze; yan bi dewletê re li ser dehatûya Miletê Kurd bazarek bike. Yan şerdeke bide pêş, yan qewlek bistîne. Tenya Öcalan bikaribe, PKK hilweşîne û şerê çekdarî rabiwestîne, ji vê mezintir xizmetek din nîne.

Bêguman Miletê Kurd li Turkiyê, Îran û Suriyê vaye sed sale ku li benda statûyek milli ye. Lê pir mixabin ku sazûmana dijraberiya Kurdan, ne xwest ku van perçeyan statûyek rewa saz bibe. Mixabin ku PKK jî, gelek caran bi kiryar û tevgerên xwe rêya neyaran xweş kir û bu sebeb ku neyar teda û zordestiyê zêdetir kirin, Miletê Kurd bendewar hiştin. PKK bu sedem ku neyar daxilî Rojava û Başur bibin û destkevîyên wan dorpêç bikin. Ev yek, ne rewaye û bi hîç şîweyek nayê qebûl kirin. Lewra PKK êdî divê tevgerên xwe rabiwestîne. Dev ji şerê çekdarî berde, grup û dezge û komên derdora xwe li gor vê rewşê agadar bike, hemû rêxistinên xwe hilweşîne û şewazeke eşkere û demokratîk hilbijêre. PKK, Hetanî îro gelek xetayên mezîn kir. Divê ji îro û pêve, xwe sererast bike û xwe ji şermazarîyê dûr bixîne.


Li bîr e, wexta ku PKK hate damez-

randin bi dirûşim û helwestên milli derket pêşberê Miletê Kurd. Öcalan û rêxistina wî PKK, dane zanîn ku wê Kurda ji bindestiyê rizgar bikin û wê Kurdistanê serbixwe, azad û hev-girtî ava bikin.

Miletê Kurd di vî 40 salê rabirdî de, çaverê ma ku PKK ji bo wan welateke azad çê bike. Li ser vê yekê piraniya Kurdên bakûr, bune pal û piştta wê helwestê. Bi hezaran gencê Kurd bawer kirin ku, wê, welatê xwe rizgar bikin lewra geyştine PKK'ê û çek hilgirtin. Mixabin 40 sal bi vê helwestê şerê çekdarî kirin lê tiştek bi ser tiştek neket. Roj bi roj PKK ji daxwazên milli dur ket û dest bi inkara xwestekên rewa û netewî kir. Ev qedereke reş bu. Tiştê ku PKK pêşniyar kiribu nehatin cîh. Di saya siyaseta çewt a PKK'ê de, roj bi roj aîdiyeta Kurdî ber bi paş ve çû. Kurd ketin nava xetereyê gîran. Bêguman, PKK rêxistina Evdila Öcalan e. Ne qabile ku ji xeynî Öcalan tu kes partîya wî biguherîne yan jî hilweşîne. Bi her hal Öcalan di her qonaxê de, xwe û partîya xwe li gor demê guherand. Dema Öcalan hate girtin û wî anîn Turkiyê hê di balafirê de got ku: “Ez ji dayikên leşkeran lêborînê dixwazim, dîya min jî Turk e, eger fersend û mecalek bidin min ez hazirim xizmetê bikim.” Piştî siyaseta PKK ji nuve hate sererast kirin. Bi navê KCK rêxistinek berfireh û payeberz a wek sîwan hate ava kirin. HDP hat saz kirin. Piştî van bûyeran PKK yekser ji helwestên Kurdewarî dur ket. Banderok dereke li ser PKK'ê peyda bu û roj bi roj PKK ber bi xêrnexwaziyê ve hilkişîya.

Bîr û raya Kurd baş dizane ku, PKK ji roja ku hatîye ava kirin û hetanî îro; di şerê çekdarî de buye sebeb ku gelek kes werin kuştin, yan ji aliyên neyaran ve, gelek alîgirên PKK'ê werin kuştin. Eşkere ye ku PKK dinav xwe de jî; ji 15 hezar kesan zêdetir hevalên xwe kuşt yan jî, da kuştin. Di maweyê 40 salan de, bi sedan kesên welatparêz ku her yek ji wan kadroyên hêjayên rêxistinên cûdayên Kurdistanê bun, bi destê çekdarên PKK'ê hatin kûştin. Li gor amarên sazûmanên mirovperwer û li gor raya sazûmana Miletên Yekbûyî, ji 20 hezaran zêdetir zarokên Kurd, di çalakîyên PKK'ê de, hatin kuştin ku hê temenê wan negeyştibu 18 salan. Di vî şerê PKK'ê de, ji 50 hezaran

zêdetir Kurd hatin kuştin. Ji 10 milyon zêdetir Kurd penaber bun. Her wiha bi dehan hezar Leşker û ewlakerên dewletê ji hatin kuştin. Agir



kete dilê dayikan. Ji herdu alîyan jî nalînên xemgîn bilind bun, ew êşa dilê dayikên dilşikestî vegehiya kîn û xezebeke mezin. Ji vê kîne nijatperestî û Koricîti istifade kir. Ev yek webalêke mezin danî pêşberê PKK'ê û Öcalan. Berê Kurdan piştgîrî kiribun ku kaşo wê Öcalan wan rizgar bike. Lê paşî dîtin ku ev xeyalek xam e; wê ca ketin derdêk ka gelo wê çawa ji PKK'ê xilas bibin. Bêşik, ev dîmen dîmeneke pir xemgîn e. Secere û serborîya Öcalan ne paqij e. Lê îro êdî derfet û fersendek nû peydabuye û eger şaşitiyek nu dernekeve pêş, ev qeder di qonaxê veguhastinê de ye. Lewra Dewlet bahçelî k udi hemu jîyana xwe de li dijî Kurda siyaseta meşandîyê; ew bi xwe jî şensek dide Öcalan ku şerê çekdarî biqedîne, daxilê siyaseta sivil û medenî bibe. Her wiha Erdoxan jî li himber van pêşhateyan dernakeve û ew jî terefdarê “jîyanek bê şiddet û teror e.” Bi van sedeman îro rêyek nu vebuye. Hêvî ewe ku jî wê fersedê sûdek were girtin û dawî li buyerên leşkerî, çekdarî û siyaseta tundperest were.

Banga Öcalan bi van sedeman jî, bangê gelek giringe. Lazime were destek kirin. Dawî li kuştin û mirinan were, xwîn nerije, jîyanek azade destpê bike, rihetî, firehi û dilşahiyeke peyda bibe. Aborî xurt bibe, pireke hez û evîne were ava kirin, destberayetiyeke aj bide, neyartî, nevanî, xêrnexwazî biqede. Dilovanîyek bikeve dilê aştiwxaz û mirovhezan.

Heyf û mixabin PKK 40 sal zêdetire ku karîna û hêz û enerjîya Kurdan heder dike, berhewa dike. Her wiha bi hezaran gencê Kurd wek xerca avahiyên biyanan bikar tîne. Hestên netewî têk dibe, diroka Kurd, ala Kurd û aîdiyeta Kurd şilo dike, xera dike. Kurd bi sedem siyaseta çewt a PKK'ê; ji Kurdayetiyeke, ji esil û astarê xwe dur ketin. Ev bang hêvîdarim ku li vê bêsiûdiyê jî dawî bîne. Lewraye ku bangê giringe. Ji bo ajdana aîdiyeta

Kurd fersendek baş e. Bi raya min PKK hetanî îro, wek rêxistineke bêberpîrsiyar tevgeriya. Tevgera PKK'ê tu sûd û feydeyek neda tevgera azadiya Miletê Kurd. Dîyar bu ku PKK'ê ketibu astengiyek mezin û dinav dorpêçêke dijwarde mabu asê. Bi zanîni yan jî bi nezanîni, PKK zêdetir ketibu bin bandora neyarên Miletê Kurd. Ev yek ji bo PKK bu destpêka qelsbunê. Lewraye ku PKK omrê xwe qedandibu. Banga Öcalan, ji hemû Kurdistanîyan û ji hemu dostên Miletê Kurd re ye. :PKK xwe hildiweşîne. Hewcedarî bi PKK'ê nemaye. Niha gelek hêz û rêxistin û kesên rayedar; bala xwe dane ser vê bangê ka gelo wê pêk were yan na. Ka gelo wê Qendil û Ewropa bi xeberê Öcalan bikin yan na.?

Bêguman, ev bangê gelek giringe û lazime encam bide, bigêje armancê. Eger PKK dixwaze ku qenciyêkî bi Kurdan re bike, divê bi zûtirîn dem bi ya Öcalan bike û dev ji çekan û şerê çekdarî, berde. Qendil û baragayên din yên PKK, bi hestên berpîrs tevbigerin û guh bidin banga Öcalan û her yek ji wan di qada xwe de, xwe hilweşînin, xwe sererast bikin, vegerin ser qada sivil û demokratîk. PKK û alîgirên wê; bawermendî û hişmendiyek Kurdî werbigirin. Digel hêzên welatperwer pêwendiyên dostane û demokratîk pêk bînin. Di qada tekoşina sivil û eşkere de, jibo bi destxistina mafên serekeyên Miletê Kurd bixebitin. Ya bixêr ev e.

Gereke keç û xortên Kurd ku bi salane piştevanî û şervaniya PKK dikin, guh bidin banga Öcalan û werin, hê ku roj nebuye dereng dev jî şer berdin. Jibo xirabiya Miletê xwe şer nekin, nebin sebeb ku navê Kurd zêdetir xirab derkeve; Kurd wek şerûd û sucperwer bêne binav kirin. Bila terefdarên PKK'ê, werin qada sivil û zêdetir nebin xerca rêbaza dijimanan. Banga Öcalan li keç û xortên Kurd ewe. Lazime ew jî banga Öcal bipejirînin û êdî çekên xwe bikar neynin.

Kurdayetiya wê serdemê û Kurdayetiya niha



N. Vênûs Fayêq
W. Hesen Mukerem

Li wir tiştê min tune bû. Cara yekem ez li ber lêkolînerê Holendî rûniştim ji bo yekemîn pirs û bersivan, min pir bi serbilindî got ku ez ji Kurdistanê hatim, Kurdistaneke ku hemû laşê wê ji aliyê dîktatorê herî hov ve hatiye şikandin.

Ez dikarim amajê bi navê dehan şoreşger û rewşenbîrên dîroka Kurda bikim ku wêneyê neteweya xwe di xeyala lêkolînerê hollandî de derxim.

Axir, gelek ji me kurdên li dervayî Kurdistanê wêneyekî bi rûmet ê neteweya kurd hez dikin ku li ser dîwarê xeyalî yê cîhana derveyî Kurdistanê daleqînin.

Di balafirê de îngilîzek li kêleka min rûniştibû. Dema min got ez kurd im, got: Yanî tu Helebçeyî yî? Ez serbilind bûm ku Helebçe bûye nasnameya me û di balafirê de bi me re ye."

Hevalekî ji min re got: Keça hevalekî min li navekî digeriya. Min piştî Mîna Qazî Mihemed an jî piştî Mestûra Erdelanî Mestûra pêşniyar kir. Keça wê ne tenê nizanibû ew nav kî ne, lê dikeniya.

Axir keçan hene di social media de tenê selfie û mez û xwînê wan dikin ku ji tirk û farsan wergirtine, û tenê guhê wan didin sitranan ku hemû



muzîka tirkî û erebî ne.

Ew ku dizanin hepse xana Neqîb, Xanzada Mîrê Soran, Adîlê Xanîm û Leylâ Qasim kî bûn?

Ew resenayetiya ku em bi wan nasnameyê dikin, keçên model dixebitin ku morikên resenê kurdayetî bişewînin û jê bikin.

Tirk û farisan ne tenê çanda Kurdistanê neparastine, belkû hemû nasnameya wê berovajî kirine, û tevlihev kirine.

Diyardeya modelan beşek ji faktorên çêkirî ye ku mebesta wê ye ku tevhîya çand û nasnameya me berevajî bike.

Me ku guhdariya sirûda Ey Reqîb kir, dema ku pirtûkên lêweya hînbûna kurdayetiye dibûn û bi dizîve me destpê dikir û dixwand, kurd li germahiya kurdayetî û nîştimanperweriyê de bû Jinan "sak"ê bê qul û serê xwe ji enîşkêve re dagirtibûn, û "pêlavên pajinean" di pêyên wan de bûn.

Gelek cure porên lûlîkirin û xweşxistinê jî hebûn, lê ev tiştên ku neteweyî bûn, wek xwe resen hebûn û destkarî nekirabûn...

Jinan mamoste, axaftvan û hunermend bûn.

Em dagirkirî bûn, çand û taybetmendiyên me yê kurdewarî hebûn û em her tim pê serbilind bûn.

Ez nabêjim ku civak pêşde neçe û neguhere. Ez dibêjim divê hûn çanda xwe biparêzin û bi hêskirina wê xerab nekin.

Tiştê ku niha diqewime ne pêşketin e, rakirina nasnameyê ye.

Çi neteweyek wek neteweya Kurd bêpar e xerab e li esl û resenayeta xwe ...

Gava ku dibêjim "Bê xêr em gerdûniya bîrê me dîsa bixwînin," wateya wê nabê ku em xasîyetên neteweyî ya xwe jê bibînin, lê divê bi aqil gerdûniya bîrê me dîsa bixwînin û neteweya me bi tiştên resenê xwe

şanê milletên dinê bidin, ne bi rewşê xerab...

Dema ku hin kes di bedewiya derve de guhertin û pêşkeftinan dibînin, lê Ewropî mejûl in ku dil û hişê mirovan paqij bikin.

Dema ku jinek di televîzyonê de bibêje: "Ez naxwazim bi dînar şabaşê bikirim, ez dixwazim bi dolar şabaşê bikirim" êdî ez divecinqim.

Gava ku rojane wê hemû bi navê "keçî model" dibînim, bi wê hemû nêştergeriyên xweşkirinê derdikevin, gelekîyan jî tiştê din nikarin, ji weha belavkirina civakê tu karê din nake, lê li ser sosîal medyayê xwe nûnerê kurd nîşan didin, ez ecêbgirtî dibim.

Ez digirim wê mijara di navbera "Ey Reqîb" û bûn bi modelan de, û dipirsim: "Çi lê hat?"

Dema ku mînakên me mamosteyan, helbestvan û şoreşger dibûn, bo jinên îro bûn modelan.

Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê


Rêjîma Îranê welatîyekî Kurd li bajarê Urmîyê de kuştin

Li berdewamiya teqeya xoserane hêzxên rêjîmê li xelkê medenî, hêzên hov ên rêjîma Îranê li bajarê Urmîyê de bi awayê rasterast û bê aghdarkirina berê, teqeli welatîyekî xelkê bajarê Urmîyê kirin û ew kuştin.

Pêka rapora Kurdpayê, roja Şemî 9ê Xakelêweya 1404 a Rojî, hêzên hov ên serbazî yê rêjîma Îranê li taxa Terziliya ya bajarê Urmîyê de bi awayê xoserane û bê aghdarkirina berê, bi awayê rasterast, teqe li welatîyekê bi navê "Mihemed Husênîjad" ê xelkê "Gundê Qışlaxê" ser bi bajarê Urmîyê kirin ku li encama vê teqeya xoserane de ew welatî, hatiye kuştin.

Pêka rapora Kurdpayê, hêzên rêjîmê bi gumana vê ku tiştên qaşax digel wî hebûne, teqe li wî welatîyê Kurd kirine, ew li halekê de ye ku navbirê ti tişteke qaşax digel de nebûye.

Ew hêceta çewt a rêjîmê bi tenê bo perdepoşkirin a teqeya xosearne û encamdana vê cinayeta hovane ye.



Rêjîma Îranê li xistinexwarê ya balafira rêvîngî ya Ukraynê bi tawanbar hate naskirin

Li encama şikayeta welatên Ukrayn, Kanada, Birêtaniya û Swêdê bi dijî rêjîma Îranê, Şêwreya Saziya Cîhanî ya Esmaniya Sivîl anku "ÎKAO"yê, rêjîma Îranê li xistinexwarê ya balafira Ukraynê de bi tawanbar nas kir.

Roja Dûşemî 27ê Reşemeya 1403 a Rojî, Şêwreya Saziya Cîhanî ya Esmaniya Sivîl, bi tevahiya dangan, rêjîma Îranê li xistinexwarê ya balafira rêvîngî ya Ukraynê û kuştina 177 kesên li vê balafirê de, bi tawanbar nas kir.

Pêştir rêjîma Îranê di cihê bersivdana li derheq vê cinayeta xwe ya hovane, îdia kiribû ku vê Şêwreyê, berpirsariya hewce bo pêregihîştin bi vê dosyê nîne.

Piştî bi tawanbarnasîna rêjîma Îranê ji aliyê vê Şêwrayê ve, welatên Ukrayn, Kanada, Birêtaniya û Swêdê, destxweşî li serok û endamên Şêwreya "ÎKAO"yê kirin ku bi dengên xwe, li tenîştê malbatên qurbanîyan sekinîn û ragihandin: "hekî rêjîma Îranê nerizayetiya xwe li hember biryara "ÎKAO"yê bide nîşandan, dê rastî dosyeyek nû li Dadgeha Navnetewî ya Lahê de bibe û dosyeya duyem li dijî rêjîma Îranê li dadgeha Lahê, belgeyek din ji dadwaziyê li dijî rêjîma sitemkar û cinayetkar e".



Amara qurbanîyên teqîna mînê li salekê de bi hilkevta 4ê Nîsanê

Rapora amarî ya Hengawê derbarê 57 qurbanîyên teqîna mînê di sala 2024an de li Îranê bi hilkevta roja Cîhanî ya Hişyarkirina Medyayî ji Metirsiyên Mînê

Her sal roja 4ê Nîsanê, ji aliyê Civata Giştî ya Netewên Yekgirtî ve bi mebesta aghdarkirina metirsiyên teqîna mîn û navçeyên ku mîn tê de hatine çandin, û gulleyên neteqiyayî yê şer, wek "Rojê Cîhanî ya Hişyarkirina Medyayî ji Metirsiyên Mînê" hatiye binavkirin. Ji bo vê mebestê, Saziya Mafê Mirovî ya Hengawê raporek amarî ji qurbanîyên mînan di sala 2024an de amade kiriye, ku tê de xuya dike ku di wî heyamî de herî kêr 57 hevvelatî li Îranê bûne qurbanîyên teqîna mînan.

Li gorî amarên tomarkirî li Navenda Amar û Belgeyan a Saziya Mafê Mirovî ya Hengawê, di heyama sala borî de, li navçeyên sînorî yê Îranê herî kêr 19 hevvelatî ji ber teqîna mîn û cebilxaneyên şer yê karnekirî hatine kuştin û 38 hevvelatîyên dinê jî birîndar bûne yan kêmendamiyên bûne.

Herwiha di heyama sala borî de herî kêr 5 zarok û nûciwnên bin 18 salî û 4 jin jî bûne qurbanîyên teqîna mînê. Di nav van kesan de 3 zarok û jinek Belûç, 3 zarok û jinek Ereb û jinek Kurd hebûne.



Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdiştanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (491)



PÊŞEWA'yê KURD

RÊBEREK Û DESTPÊKEK
BO HEMÛ QONAXÊN XEBATÊ



Partiya Demokrat A Kurdistanê Îranê
Navenda Ragihandinê